ÇAVERÊKIRIN



Eyûb Reşîd Nisrî

Eve demê hatinê ye livîna kaxeza û hatina bayê ji derve yên dibine dengê pêjna te, hemû tiştek yê bûye tû. Xwe tabloyên bi dîwarî ve, wênê te nîşanê min didin, car jî hizir dikim li beranber min rûniştîyî û em dikevine sohbet û axavtinên xweş, belê mîle demjimêrê wenake ev hizre ya berdewam be, dibêjine min eve ez ji demê destnîşan kirî burîm.

Erê tu dibêjî nexweşiyek bo çêbibe (xwedê neke) belê çawa hinde gîro bû, bawer nakim ev dîtina me li def wê hind bê biha be ku bi karekê dî biguhere, ne wenake, eve daxwaziya wê bû û me gelek qurbanî da heta ev delîve çêbû, dê her bihê heger niha hat dê çend xweş bibe.

Ji nişka ve dengê dergehê ji derve û pêjnekê hat destê rastê bi her du rûyên xwe de îna û paş tiblên xwe kirine di nav pirça xwe re û bo serî bire (yeka rastê ez axiftina yekê çi bibêjim, dê bibêjim xêr bû tu gîro bûyî. Ne, ne, ne ku pê nexweş be, dê bibêjim baş bo xwedê kerem kir tu hatî.. ne wella hema dê berê xwe bidimê û bigirnijim. Ka dê ew çi bike û çi bibêje) belê her wekî eve dengê pêt zelamaye, da biçime ber dergehê jorê demê min sehkiriye holê sertîra min bi berî keft demê gotiye min: Zîrek mamo te xêre tu neçûyî.. xwe te çi nexweş nînin çunkî kes nema li vê derê hevalên te got bi tenê maye di jor ve.